# Alyek ji rewişt û tîtalên êzidyan

Li Vir emê lêkolînê kin kû çend rewişt û tîtalên êzidyan ji xwendavanên qedir giran re û xemxwerên van rewişt û tîtalan yên li civakê êzidyan de û weke karîn û zanîna xwe emê dene ber behisû xeberdanê. weke tiştê me dîtî û me pişik danî di wan rêûrisman de kirî ne bitiryan kêm tir...

Li vê kurte gotarê, em pala xwe na dene wan pertokên li dor rewşa civakê êzidyan hatine belave kirin ji ber bitirya wan, em nab-



**Silêman Êli Reşkanî**

êjin hemî bi destê neyara û nezana hatine derketin...

Çaxê em di bêjin nezan yan neyar ew bixwe jî xeuyane û ewin yên bi nivîkana wan pertokan û vekolînan rabûîn li dor êzidyan, ne hinde yî şareza bûn li dor rewşa civaka wan, êkî çav li yê dî dikir û pêzanînên neyî qenc û durist jê di hilgirit û diguhasit û çavê xwe di girtin û xwe lirêka şaşyê dedi berda û bi vî karê reşpêzanîn bi awayekî ji xwendevanare pêşkêş dikirin ûew rêka xwar û şaş ji xwere di kirine rêkarasit û durist û ji dûr awir didana vê civakê û ta cara li paşerojê bi hizir ne di bûn loma neho eu li ber çavê xwendevana reş bûne û dîrokê

Sed mixabin wan nezana gelek xwendevan yên ne yîşareza bi xwere şaş kirin û bijana xwe êxistin belê piştî ew xwendevan ji nêzîk ueli ser rastya êzidyan û kevnya wan seknîn û berxwedan ê li ware rewşenbîrya êzidyan rûda û zana û pispor li nav wan de peydabûn û ji marke mezin vekolîn û gotar li dor civaka wan bi destê wan hatine nivîsan xapandin xwe ji rêka şaşyê dûr kirin û êkser neyarya wan nivîskarên bexit reş hate xuya kirin...

Emê niho xwe ji pêşyê berdin û berew cergê babet rê girin û ji ber da bitir ji xwendevana re rohin û eşkere be emê van çend rewişt û tîtalan bi ser xala nivîsin...

**1-** li çaxê çandina dexil û dan(1), cotyar li zevyê di sekine û tov li şovê beladike û mista berî tijî tov dike, dibêje bi destûra xudê, ya xudê yê me zin û nav şîrîn risqê me liteye û tu me û her kesekî li ser qadê ji risq û xêrê bê behir nekî û mista berî beladike û di bêje ev behra teyr û tivîla li pêrre

dibêje ev miste behra gerrok û belengaza û htd...(2)..

**2-** heke kesê êzidî xêzan pêkanî û ji mala xwe ya kevin, dak û babê xwe cudabû, xanyek ji xwere avakir û mala xwe guhasit diviya ser birrekê bi xêra xudanê (xudawendê) malê bikuje û şêyan pîrê wî kuçkê mala wî bi kola ji ber ew kuçik dibe weke nîşana ocaxa wê malê(3)..

**3-** Her xêzaneke êzidî salê çend ser bira bi xêr di didin, çi bi xêra xudanê malê yan bi xêra mirya, vêca çaxê kesê ser birr ser jê kir kêrê li ser situkira wê di dane û van çend peyva di bêje (Bi destûra xudê, ya xudê tu qetla wê helal kî û gunehê wê betalkî)...

**4-** Êzidî û rengê şîn:

gelek dan û sitandin û gengeşe li dor rolê rengê şîn li civaka êzidyan de çê bû ye û hêjmareke gelek gotar û vekolîn li dor vî tiştî hatine ber hev kirin û bitirya van vekolîna bi destê nivskarên şofînî hatine nivîsan loma herdem rolê vî rengê pîroz li nav êzidyan da bi awayekî vajî dane xuyakirin...

gelo ji ber çi êzidî xwe ji vî rengî dûr dikin?

weke me dîtî û pêzanînê me ji rê û rismên civaka êzidyan dîtin û hilgirtin, rengê şîn gelek pîroziya xwe heye linav wande belê mixabin percekî mezin ewan zanîn li dor vî rengî nînin, di bêjin gunehe êzidî xwe nêzîkî vî rengî bikin û çaxê mirov piris jê dike nekare yan nizane bersiveke zanistî bide û yê êkser wan vekolînê neyara ji xwere ke jêder...

Bi dîtin û bawerya min li dor vî rengê pîroz nabe tu cara mirov xwe şaşke û bi awayekî serekî ji vî rengî xwe dûr û jê

birebe, êzidî bi xwe tu cara bivî tiştî bi hizr nabin kû xwe dûrî rengê şîn bikin û ew bi xwe (şîn) rolekî giring li hemî civakande heye li seran serî cîhanê...

Kesê bêje rengê şîn li êzdya gunehe yan qedaxeye ew xwe şaş dike, belê êzidî xwe ji vî rengî dûr dikin ji ber gelek yî pîroze, ne xwe ji pîrozya wî dûr dikin belê kêm li ber xwe dikin da pîrozya wî liba wan lawaz û bê qedir nebe...

Belê birastî çend egerên dî hene li dor çawanya li ber xwe kirina wî, êzidî dibêjin navê rengê şîn ji şînê hatye û berî van sala gelek komela rengê şîn liber xwe dikirin çaxê rûdaneke di tezîn lê rûdaba...

Komela êzidyan bi awayekî zanistî hemî reng naskirye, çi rengên sar yan yên gerim û ji kevnde her kefit rengên tîrêjê naskirine û çawa rengên dî jê dabin û sebaret pîrozya rengê şîn li nav êzidya ji ber rengê esmanê xudê yî şîne û ciwantirin reng ewe u heta niho êzidî morkê şîn bi pêşanya zarrokê xweve dikin ji ber çav lêdanê û bi bêjin caxê kesekî cav dijwar û awir xirab li zarrok nêrrê êkser cavê wî yê keve rengê şîn û awira wî yê pêve mîne û li zarrok dûr be û her weha nîşanên şîn bimala û her tiştekî bi qedir ve dikin, vêca ji pîrozya vî rengê û da ne ête pîskirin êzidî herdem bizavê dikin xwe ji ber xwe kirinu wî dûr ken û belê herdem bi paqiji bi parêzin û maleke êzidî nîne heke nîşana esman yan şîn lê nebe...

**5-** Heke kesekî êzidî bi jana taya kêma heyvê keft naxasime zarrok, hingê xêzana wî zarrokî bi lez wî bi tenya (reşya( amanekê nîşan dikin û heke ew aman ye çingandî be

li ber hayvê çaxê di ête girtin (xeyrandin) hêj çêtire ji ber xudawendê vê tayê (heke fexredine)(4)û şê wê wan di bine weke yê heyvê û rojê li pêşenya nesax vê nîşanê (t) di din û lişîng jî nişana (o) li desit û ling didin, ramane wê kû êzidî pîrozyeke mezin di dene van herdo nîşanên xudê, dîsa li dor ve janê drozeke teybet heye bi ser nesax de di bêjn bizarê şêxekî yan pîrekî dibêjinê diroza (kêma heyvê)...

**6-** Her maleke êzidî ye xudan pez be, diviya hersal li werzê biharê, nezasime çaxê ji gund derdkivin berew biharya di çin, ser birrekê bi xêra (Memê şivan) xudawendê pêzdikuje û gelek ji wan vê ser birê li demê birrîna hiryê dikujin û çaxê ji biharya di veger in sewarên xwe û werzê havînê bi germya xweve oxirdike û yê payzê bi pîr û kalyê ve di çe û vê qada xudê di sipêrina werzê zivistanê yê bi befir û baran, hingê pêdviye pez bête êmkirin ji ber tu çêre û keskî li pûyê qadê namîne û ewên jî yî pêkhetyê ji kayê û ceh weên li werzê havînê komkirin ji ber vê mermê û her li vî çaxê pez desit bi zanê dike û piştî çend heftya heke şîr ji berxa zêde ma, pez dête doşan û wî şîrî di meynin di kine masit û hêj xêzanê bi awayekî serekî jê pêdviye bi xêra xudê û Memmê şivan ji wî masitî li ser xêzanên bê pez belakin û çaxê cara berî masit li ber xwe di danin van çend peyva di bêjin (Tamî şamî ya xudê û xudanê vî tamî em her sal bi xêr û xweşî û silametî bi xum ji vî tamî), bi restî vê gotinê ne bi tinê li ser masit di bêjin, belê her berhemekî salane hebeçî ji zevyê yan pîzdi bîjin...

**7-** Roja Şemyê li ba êzidya pîrozyeke mezin û mukum

heye û li vê rojê bitirya hozên êzidya tu tiştî ji mala xwe na derînin û bi ser rêka nakevin û gelek ji wan vê rojê ta tiştî nabine bazara firotinê û xêreke mirya li vê rojê resit hatêkser di guhêzine roja li pêrre û xejin û hilkeftên civakî jî li vê rojê na êne gêrran...

Ev pîrozya êzidî di dine vê rojê eger ewe ku di mîtolojya êzidyan de hatye xuyakirin li roja şemyê xezanê nav şîrîn û her hefit milyaketa desit bi afrandina kingatê kirin û li roja înê bi temamî anîn, loma heta niha roja înê di be bêhinvedaneke serekî hemî kar di êne ragirtin, weke çandinê û dirûnê û awakirinê, belê sed mixabin niho ev kerê pîroz kêm bûye û berew rêka nemanê di çe, birastî fere em li bîr bînin ku ew kêm pûte pêdan niho xwe bi fer di bîne kêm bibe ji ber xebata mirovan ya kar û barê ji yanê niho vî tiştî di xwaze nexasime li civakeke cotyer û rezvan de...

**8-** Êzidî gelek rêzgirtinê di dene ronahyê, weke ronahya agir û ya hev û rojê û dibêjin ew mezintirin diyarya xudê ye ji mirovanre û her wiha di bêjin çaxê (Birahîm xelîl) xudê naskirî birêka van nîşana geha xudê nasyê û cara berî got, heyv û roj ezdyê minin paşî got yê heyv û roj çêkirîn ew ezdayê mine û her bivî karê û rêka van nîşana ew geha xudê nasye..

Ezdî gelek cara bi ronahyê sond xon û bibêjin bi vê nûra xudê çêkirî, heke ya heyv û rojê be yan ya agir be û agir jî rolekî giring li rê û rismên êzidyatyêde heye, çi hilkirina fitîla li lalişê yan li her cîyekî pîroz û li malên du nava (şêxûpîr) di bêjine wan malên xudan ocax, li hêvarek taybet ji

heftyê fitîl li van mala di êne hilkirin û bitir li hêvara çarşemê li her heftyekê û li hêvarên cejin û hilkeftên dînî, weke cejna ser salê û rojên Êlzî û herdoçila û xidiliyas û htd...

**9-**her hineke êzidî, çaxê zarrok jêre be diviya ser bi rekê çi & kçik yan mezin bi xêra (xatûna fezra) bi kûje û bitaybet zadê wê ser birê bis jin û ev rewîşt hefa roja fro li nav komela êzidyan de ye berdewame û dibêjin xatûna fexra li hana jina di êt li çaxê zerrok bûnê(5)...

**10-** her mêrekî êzidî, pêdviye biska wî bête girtin li jiyê zarrokyê(6) û girtina biskê jî bidestê şêxê biskê diête dûristkirin, her hozeke êzidya şêxê biskê yê taybet heye bi vî karî di rabe û mala zarrokê bisik bête girtin ser birrekê bi xêra xudê û xudawendê biskê bi vê helkeftê bikuje...

**Perawêz:**

-

(1) Dexil û dan, ji genim û ceh û her tiştekî yî heb hebî bête çandin yî pêk hatye...

(2) Êzdî dibêjin, mirov hemî li malê dinyayê yî hev pişke...

(3) Her xêzanekê kuçkekî serekî hebû, xwarna giran bi rêka agirê dara têde di heyrandin...

(4) Ew xudawendê heyvê ye û her tiştekî pêve girêdaî...

(5) Ew xudawenda zarrok bûnê ye û navê wê rê durist (xezal)e, şemsanyê ye...

(6) Bisik, perêek ji pirça serye ji nêva qotê zarrok di hêlin, na birrin, ew bi destê şêxê wan diête birrîn...